

## Kurmanji

### Test a nirxandina ziman yek sal beriya têtetina nava dibistanê

Ji bo bidest xistina serkeftiyê di dibistanê de, pêwîste ku zarok bikare li gor temenê xwe bi kêrhatî bi zimanê Elmanî biaxive. Di Bremen, hemî zarok beriya têtetina nava dibistanê, divê testa zimanî derbas bikin. Bi vê nirxandina zimanî, pêşveçûna ziman tê lêkolîn kirin. Eger pêwîstiya zarokî bi alîkariyê hebe, di sala beriya têtetina nava dibistanê de dersa ziman tê jêre bête pêşkêş kirin. Xercê testa zimanî û fêrbûna ziman li ser milê Şaredariya Bremenê ye.

### Çi pêvajoyek tê bikaranîn?

**Testa Ziman a Cito.** Bi testa ziman a Cito sê qad tên nirxandin:

**Naskirina peyvên taybet (peyvên kiryar nediyar):** Hejmarek tişt (wek mînak qelem, otomobîl) û lêker (kenîn, nivîsîn) tên gotin û wêneyê kêrhatî divê di nava rêzek ji wêneyan were bijartin. Nas kirin û fêm kirina peyvên taybet (peyvên kiryar nediyar) merca bikaranîna wan bi rast (peyvên kiryar diyar) e. Bikaranîna rast a peyvekî tenê bi fêm kirina vê gengaz e.

**Fêmkirina peyvên nedîtbar:** reng, şikil, hejmar, mewqe (wek pêş / paşê) û pêvajoyên dem-dar (wek pêşî / piştî) û herweha taybetmendiyên wekhevî (wek mezintir / biçûktir) tê pirsîn. Zarok divê bersivê bi bijartina wêneya kêrhatî, destnîşan bike.

**Naskirina dengî (hişmendiya dengsazî):** Du peyv bi dengên bilind tên gotin ku bi dengên wekhev (wek Nadel – Nudel) hene yan wek hevin (wek Dach – Dach). Zarok dibe cudabûna dengên bihîste nasbike. Dema hînbûna xwendin û nivîsandinê di dibistanê de, zarok divê bikare dengên wekhev nasbike.

### Kê beşdar dibin?

Hemû zarokên ku di sala 2020 de di Bremen dê diçin dibistana bingehîn.

### Test a ziman a Cito çawa birêve diçe?

Zarok bi çavdêriya çavdêr bi komputerê di testa Cito de beşdar dibe. Ev teste nêzikî 25 deqîqeyan berdewam dike û di dibistana bingehîn de birêve diçe.

Primo qeşmerê biçûk, wekî sembola komputerî di maweya testa zimanî de cem zarokan dibe. Ji bo ku bala zarokan têkneçe, ji wan re berguhk tê dayin. Zarok divê bersivê bi bijartina wêneya kêrhatî, destnîşan bike. Pêwîst e ku ew mîşkê komputerê bikar bînin. Hinek zarok hene ku nikarin mîşkê komputerê bikar bînin. Lê ev ne pirsgirêk e. Berî dest pê kirina testê, zarok bi rêya lîstinê hîn dibin û îmkana meşqa kar kirina bi mîşkê ji bo zarokî dabîn dibe. Tecrûbe nîşan dide ku zarok pir bi lez û bêyî pirsgirêk ev şarezayiyê fêr dibin.

### Beşdarbûna di testa nirxandinê de mecbûrî ye?

Erê. Di Bremen, hemû zarok mecbûr in ku sala beriya têtetina dibistanê testa zimanî derbas bikin. Zarok mecbûr in ku di kursa perwerdehiyê de beşdar bibin. Ev berpirsiyariye di paragrafa §36 ji zagona perwerdehiya Bremen de hatiye nivîsandin.

### Çi alternatîfek ji bo testa Cito heye?

Ev îmkane heye ku rapora bi navê zimanî-naskirinê cihê testa ziman a Cito bigire. Divê hûn daxwaza xwe ji bo vê bijareyê radestî Senatora Jin ji bo Zarok û Perwerdehiyê (Senatorin für Kinder und Bildung) bikin. Berpirsiya dana xercên têkildar liser milê we ye. Agahiyên bêtir dikarin li ser Malpera Sereke ya Senatora Jin ji bo Zarok û Perwerdehiyê (Senatorin für Kinder und Bildung) (Zêdetir [www.bildung.bremen.de](http://www.bildung.bremen.de)) bibînin.

### Gelo encama testê li ser beşdar bûna di dibistanê de bibandor e?

Na, encama testa nirxandina zimanî li ser beşdar bûna di dibistana bingehîn de bêbibandor e. Beşdar bûna zarokî di kursa perwerdehiyê de ji zarokî re kêmasî nayê hesibandin. Berevajî vê, zarok piştgiriya bêhtir werdigire û baştir ji bo beşdar bûna di dibistanê de amade dibe.